Peşrîmekirina dilan

Bilind Mihemed

Şevên herimiyên qermok
fişara xewnên herifî difetisînin.
Car di gûya eşqa te de, fenereka kiz
di çavên xwe de dikire wêneyekê qerimtî û
hemû bilindahî li jêr sîbereka mirî dibûne gok.
Car ji dûr babelîskên girnijîna te ya xapînok û dapûşî, hestên min diarandin
Car weku firîşteyan, geryana te di naxê min de, behiştek ji dargûzên gundê me yê sernixûnkirî ava dikir û tê de dikirme şah.
Car tu, ji rûkên xwe yên pirteqalî asoyekê rengîn di binara hêviyên min de diçînî û min hemûyê dikî barekê xeman û xem veder dihên û kovana dilê min dibe tu, tu jî hewrekê xirş, di panavên fireh de giyanê min li pey sîbera te gerokeke û li ser deryayên ne niyas, ne melevan li pey te dibeze
Di kolankên bajêrekê bê nasname de bo min bibe pêkekê şerabê û min veder bi tinê nehêle.
Hest di aryana şevên birîndar de serxweş dibin
Mest di xewneka sotî de li jêr rêjgeha rijyana peyvên te, qerqudeyê qawaneka kevnarim
Stiraneka ji rengê şevê di çavên min de dixwînî û bendeka ji rengê befrê di çavên te de ava dikim.
Serhatiya min
li ser pêçulka cotyarekê nedar

li ber pêlên payizeka pelwerîn
bi eşqa te firşik bûyime
û tu jî babelîsk
Li gel pêlên kengir pera bilind bilind
di çiyayên bejna te wer dibûm û
weku sofiyekê di nawiskên ciwanî û xwedêperêsiyê de benî bûye
Weku Memoyekê di eşqa Zînê de genî bûyî
Dûmahîk çîrok dê bi te bibêjim
Dûmahîk rondik dê bo te birêjim
Dûmahîk ristik, helbesteka agirî ye
Bûye tok û tu pê hingavtî
Dê bo te bihavêjim
Çenda nazikî!
Demê sûlava silavên te li ser belgên bihareka har min dinixêve
Çenda nazikî!
Demê tiviyeka henaseya te digehe xelkê bajêrê min, pêk ve serxweş dibin
Çenda nazikî!
Demê di semagehên tinêy de, tinê tinê bo têhneka sotî tu umêd bî
Û ezê parve dê ji kû ve aramiyê wergirim!
Di bûseya hizirên xwe de
Li ber derazînka dîdeyên te yên bi guriyê alandîn
rêvîngekê bê rê me.
Şev, li ber lêhimşta nalînan dinale
Heyv, bi tirîfeyên xwe li ser rûkên hinarî yên te dibare
Li gel hatina biharê, jivanekî bo min û xwe destnîşan bike
Li gel daralînkan henase bikîn
Te çi car çîroka evîna xwe behs nekirî ye, direwe te hejêkirin nekiribe, direwe dilê te beramber hestên te yên pir soz carekê nerm nebibe.
Direwe, tu bişêy bê evîn bijî.
Awêtebûna me ya girj
Nêrînên te yên evînkuj
Di neqeba peyvên te yên ji leila nêrgizan didagirtî
Penayê bo wê helbesta xêve bibe
Volkanên xem û xeyala di zeviya sîngê me de hilde
Ez nîgargeha hizirên te me
Tu hevrîşî azirînên min bibe
Li gel helçûnên min here û were
Bes bazirganiyê bi hestên min bike